PPP

**Qaydeyên Koronavayrusê yên Li ser Geştên hatî – dê heta 11ê Tebaxê bi awayê demkî di rewacê de bin**

# Berpirsîyarîya gava gihîştinê ketina karantinaya malê ji bo kî digunce?

Li gora biryara birêvebirîyên federal û yên eyalete dane gerokên ji cîhên bixeter hatî divên bi kêmayê 14 rojan di karantinaya malê de bimînin.

# Kîjan welat wek cîhên xeterê tên qebûlkirin?

Cîhên bixeter ji alîyê Birêvebirîya federal ve binavkirî ne û ji alîyê Dezgeha Robert Koch-ê ve weşandî ne. Di binavkirina van de pûte bi jimarên bûyeran û şofa binavkirî û nirxandinên li ser astên testê hatiye dayîn. Ji bo nihêrtineke bi tevahî li ser cîhên xeterê yên heyî vê derê bitikînin.

# 15 Temmuz 2020 tarihi itibariyle karantina yönetmeliği istisnaları nelerdir? Ji 15ê Temûza 2020î pê de îstîsnayên fermana qanûnî ya karantînayê çi ne?

Bi awayê ku ji 48 saetên gihîştinê kevntir nînbe ji bo kesên ku encama testa wan neyînî ya koronavayrusê heye berpirsîyarîya karantînêyê ya ji bo gerokên ji cîhên xeter hatî nagunce. Tarîxa encama testê xuyandî dê ji bo vê dirêjahîya demê bigunce. Test, ji bilî van dibe li Elmanyayê dîsa bê kirin, lê qaydeyên karantînayê divên heta ku encama neyînî derbikeve bên pêkanîn. Ji bilî van (digel kesên din), kesên ji ber karen xwe divên kesan, malan yan berheman bi rêya beje, bi rêya hesinî, keştîyê yan firokeyê di sîn sînoran re veguhêsin, û ji bilî van ji bo kesên ku bi sebebên xuyandî (serdana xizman, mafên mîrateyê, serdana hevjîna û hwd) kêmtirî 72 saetan hatine serdana Elmanyayê jî îstîsna diguncin. Herweha, fermana qanûnî, ji bo kesên di ser Bakurê Ren-Vestfalyayê re geştê dikin (bêyî mayîna bişev) ne guncaw e.